



Gotar û Lêkolîn
Rû.02

Kobanî
Li Ber Neynikan
Helim Yûsiv




Hevpeyvîn
Rû.03

Dr. Silêman Elyas
Desteya şünwaran
bi karê xwe radibe û
biji ji wan re



Wêje
Rû.05

Careke Din
Helebçe!
Şehnaz Şêxê



**Eger Em
Nebîn Yek...**

**Em ê Herin
Yek Bi Yek**

Hawar e Kurdo!... Halan e Merdo!

Piştî ragihandina serokê Emerîka Barack Obama ji stratejiya Emerîka bo lawazkirina DAİŞ û marjînal kirin û dawiyê jinavbirina ew hêza terorîst ku weku metirsiyek li ser berjewendiyên Emerîka û welatên hevpeyman dibin, rewşa Êraq û Sûriyê dikeve qonaxeke nû, her weha li gor stratejiya Obama erkên nû dikevin pêşiya xelkên navçeyê û Kurd bi taybetî ku çawa bikarin rola xwe ya sereke divê qonaxa nû de bilizin. Hêjayî gotinê ye ku dîsanê hin welatên herîmi ku xwe bi dostê Kurdan dida nasandin Kurd bi tenê hêştin û ew wek hate nişandan ku ger "mirov piştî xwe bi xwe nexwîne kes ji mera re naxwîne". Hêjaye ku em behsa berxwedana hêzên pêşmerge ên qehreman û şervanên azadiyê yên YPG û HPG ji bikin ku bi rastî bi qehremaniya xwe axa Kurdistanê parastin û derbeyek mezin li terorîstan dan. Îro jî hêza Kurdî dibe hêza herî aktîv li ser erdê ku stratejiya Emerîkayê piştî xwe didayekê weku hêzekî serokî bo jinavbirin û tunekirina terorîstên DAİŞ'ê û rizgarkirina axa Kurdistanê. Yek ji lingên herî serokî ya stratejiya Obama ew bû dema ku got: "Edî Emerîka xwe naxe nava şerekî nû li navçeyê. Obama weku alfiyariyek serbazî bo hêzên Êraqê û pêşmerge ferman bo şandina 25 milyon dolarên Emerîkî ji da."

Eve li Êraqê lê belê bo cîbecîkirina stratejiya Obama li Sûriyê ji erkekî nû dixê pêşberî Kurdên Rojavayê Kurdistanê û bi taybetî hêzên Yekîneyên Parastina Gel YPG (ku hêza herî zêde di sal û nivêkê de şerê terorîstên DAİŞ'ê bi dijwarî kir û gelek qurbanî dan û navçeyên Kurdî ji komkujî û enfalê parast û berxwedaneke bê hempa li Kobanê û Cezaa, Heseke û Efrînê nişan da.) çawa ku niha xelkek ji navê DAİŞ ditirse, her weha jî DAİŞ ji navê YPG û YPJ ditirse eve ne ji xwe ye belku bi tazê xwe ye leşkerî û bîr û bawerî û îradeya polayîn piştî wan şikandiyê. Stratejiya Obama a şerê li dijî DAİŞ wê yekê li ser Kurdan ferz dike ku hêj zêdetir rêz û hêza û helwesta xwe bikin yek, hemû partiyan li Sûriyê û hêza êrişkirina rêveberiya xwesar û kantonên heytî û xwe xistina bar li ser piştî rêveberiyên herî zêde bibekevin diyalogê û xwe tevî kar û xebatên bikin, xwe tevî hêzên YPG û YPJ bikin û hêza wê zêde bikin û ji niha ve perwerdekirina genc û xortan bête kirin daku Kurd li Rojavayê Kurdistanê bi tektîkên xort bikarin amancên stratejîk bi dest bixin. Li ser wê bîngehê di baweriyayî min de dive, Encûmena Niştîmanî ya Kurd (ENKS) jî xwe ji nûve berçav re derbas bike û xwe fermate (Format) bike, giranî bidin



Dilawerê Zengî

hêza leşkerî ya li ser erd, bi dîtina min li şûna ku partiyan Kurd xortên Kurdan bişînin nava opozisyona çekdarî ya Artêşa Azad û komên dinê, bila navên tabor û ketîbeyan li xwe bikin û di perwerdeya YPG re derbas bibin û bi ferman û tektîkên YPG tev bigerin. Bi baweriyayî min ewê bikarin serkeftinên mezin bo pêşewrojê bi dest bixin û eve dê di qazanca hemû gelê Kurd li Rojava û li tevahiya Kurdistanê de be. Çawa ku îro gerilayên HPG û YPG û Pêşmerge li başûrê Kurdistanê di yek sengerî de weku bira piştî xwe dane hev û şerê DAİŞ dikin û ax û gelê Kurdistanê diparêzin di baweriyayî min de bi hêsaniyê dikarin li Rojavayê Kurdistanê wê yekîtiyê çê bikin. Wêku çawa amanca serokî ya Emerîka û Obama parastina berjewendiyên gelê Emerîkayê ye divê amanca serokî ya hêz û partiyan Kurdî jî berjewendiyên bilind ên gelê Kurdistanê be... Hêviyên me mezin in û serkeftin wê ya gelê Kurd be.

Kobanê Qilçixa Zengelorkê Ye

Heger mirov li nexşa dewleta ku tê zanîn bi dewleta Islamê(DAİŞ) binêre, û li nexşa herêma Kobnê jî binere ,wê nasbike çima girêza wan li ser Kobanê diherike , her wisa bi hesaniyê wê bîner nasbike ku Kobanê bûye qilçixê gewriya dijminan. Kobanê yek ji sê girîngtrîn bajarên kurdî ne li Rojavayê kurdistanê paşî Qamişlo û Efrîn , û dibe dirêjeya deşt û bajarê Sirocê û dergehêkî istratîcî ye li ser sinorê Bakurê Kurdistan û Tirkiya. Dijminên mirovatiyê jîyanê bi wan ne xweşbû ku Rojavayê Kurdistan û bitaybet bajarê Kobanê bibe herêmek aram , awareyan bihewine û bibe simbola pêkve jîyanê ...loma em dibînin ew pişgiya hêzên reş û tîrîkî dan ku îradeya kurdan têkbîbin. Heger em guhê xwe bidinê , roja ku Tirkan û dewleta wan pêşwazî li dîlên xwe yên ku azad hatin berdan ji def DAİŞ'ê ye ?! di evîni demê de êrişên hovane bi ser Kobanê de hatin ! Pîlanekî eşkereye ku dewleta Tirk tu carî naxwaze kurd bibin hêzek sereke di herêm

û rojhilata navîn de .. û tiştê alfiyariya dewleta tirk dike rewşa xerab ya mala kurdî ye , ku ne li ser yek istratîcî û helwêstê ye . Em temaşekî , hawîr dor kurdan pîlanên wan wek yek mîlet û helwest heye û jibo amanc û berjewendiyên mîletên xwe yek artêş , al , zîman , û helwestin , lê mixabin bi tenê kurd pir al ,pir layinê siyasî ,pir ElfeBêT û ne xwedî yek pîlan û istratîcîne bo amancên xwe .û artêşa me hîn dibin navê filan partî û wêneya filan serokî de şer û xebatên xwe dike , ne di bin navê welatekî de xebatên xwe dide meşandin. Nimûna Şengal doh û Kobanê îro li ber çavaye , tiştên li wir qewimin û şer û pevçûnên kurdan xwe bixwe li ser ragihandinê ..ziyanek gihand kurdan bêtir ji şerê DAİŞ'ê huovane . Ez bawerim ku Şengal û Kobanê têrî wê yekê dikin ku kurd li xwe vegerin û van pîrsan ji xwe bikin , aya em bikude dirin , û çî alav û çekên me hene divê qonaxê de , qonaxa guhertinê dîrokî de ku li rojhilata navîn dibin . jî kurdan



İdrîs Hîso

tê xwestin kêmaniyan xwe nexin hûstê kesî , û bes bêjin _ ma dijminan nehiştin em bigên mafên xwe û welatê me perçekin?...û jî van gotinan yên ku tu nanî nadin hemwelatîyê kurd rêzgar bibin ..divê ev gotin ji ferhenga kurdan hilên , ya baş ewe ku em wê pîrsê ji xwe bikin- em Karin çibikin jibo em mafên xwe bidest-bixin? Heger em karibin wek mîlet , ne wek hêzên ne li ser yek gotin û helwêstê xebata xwe bikin di vê qonaxê de emê karibin bibn qilçixê gewriya dijminan , ew qilçixê zîlf û bê hêz , lê tu kes nikare bi bombe û topbaranandinê wî werîne der , tenê bi bihna fire û bi firek av belkî were der. Kobanê qilçixê zengelolka Tirka ye , bi hêzên reş û tarî ronahiya wê namire , û heger tirk bixwazin qilçixê gewriya xwe bi zora tang û topan binin der wê gewriya xwe birînek mezin lê çêkin .

Kobanî Li Ber Neynikan

Li ber neynika Ewropayê..

Ev demeke ku çapemeniya cihanê bi tevayî û ya Ewropayê bi taybetî rojane nûçeyan li ser Kobanî diweşîne. Di demeke kin de, bi bilindbûna asta berxwedana parazanên bajêr ji hêzên YPG û YPJ re û bi piştigiriya êrişên ezmanî yên hêzên hebvendiya navneteweyî bi birêveberiya Emerîka ye re, ew bajar bû navdartinî bajarê Kurdan li cihanê û bû sembola berxwedana azadîxwazan ya li dijî terora hêzên reşayîparêz û dijminî jîyanê. Ev dîmenê ku li hember "Raya Giştî" ya cihanê hate ragihandin, ne ji nişkê ve û bê bîngeh hate kirin. Li Ewropayê bi berfirehî behsa dîmenên recimkirin, kuştin û serjêkirina jinên ku di bin desthilatdariya Da'îşê de ne dihatê kirin. Pê ve girêdayî ew wêneyê kevin "Teqîdî" yê jina ereb û ya misilman, ku di serê her ewrupayîyekî de hebû dihatê vejandin. Jina ku di bin destê mêr de ye, nikare bêyî serê xwe bigre û porê xwe veşêre, derkeve derve. Wisa ji li malê mina koleya karê rojane yê çêkirina xwarinê, xwedîkirina zarokan û alaveke bihevşabûnê li ser textê razanê tê bikaranîn. Wêneyê giştî yê jina kurdî ku di nav civakên ewrupayî de geleki belavbûyî ye ew jina ku ji bo "kuştinê ji bo namûsê" bûye qurban. Anku Kurd mîletekî wehane ku keçikên xwe, jinên xwe, ji bo "Meseleyên Namûsê" dikujin. Nimûneyên bi vî rengî jî li Siwêdê, Elmanyayê û Bîrîtanayê bi dehan in. Di vê çarçove de, ji bo rojnamevanên "Rojavayî" balkêştirîn xal di berxwedana şervanên kurdî ya li hember hêzên tundrew û çekdarên islamî de beşdariya keç û jinên Kurdî di vî şerê çekdarî de ye. Bi vî awayî jî sedî tîrî raporen rojnamevanên ewrupayî ku



Helîm Yûsiv

di televizyon û rojnameyan de dihatin weşandin li ser rola YPJ bû bêhtîr ji rola YPG. Bi dehan dekomantar, raport û reportaj bi zimanên cuda di çapemeniya Ewropayê de li ser van keçikên Kurd yên ciwan û modern ku li hember bihêztirîn rêxistina terorîst di cihanê de şerê dikin, hatin weşandin. Vê yekê zemîneke pir baş jî bo germayiya piştigiriya berxwedana Kobanî li seranserê cihanê anî holê. Bi dorpêçkirina Kobanî ya ji sê aliyên we ku Da'îş pêk anîbû, wisa jî ji aliyê çaran ve dewleta Tirk tangên xwe rêzkiribûn, ji bilî aliyê leşkerî yê mijarê, aliyên wê yên siyasî, insanî, civakî û exlaqî jî xwe dan pêş. Vê rewşê wêneyê jina kurdî bi taybetî û yê mîletê kurdî bi giştî li Ewropayê jî binî ve serobinoyî hevdu kir. Ji niha û pêde, eger Kurdên Ewropayê bi zanebûn li ser vê babetê bixebitin wê karibin hem ji bo doza xwe ya neteweyî û hem ji bo siberoja xwe ya siyasî û civakî dostên pir girîng li seranserê cihanê qezencî bikin. Hin çavdêrin min Ev nêzikî pazde salane ku li mezintirîn welatê Ewropayê, li Elmanyayê, dijim. Di van salan de beşdarî dehan meş û çalakîyan kurdan bûme. Ev cara yekê ye dibînim, di meş û çalakîyan jî bo Kobaniyê de, ku ewqas piştigirî, dilgermî û beşdarî jî ji hêla mîletên ewrupayî ve jî bo Kurdan, dibin. Li Elmanyayê bi dehan komên Elman ku pîraniya wan bi ser "çeggirî" û "keskan" ve bûn tev li meşan dibûn û jî Kobaniyê re distiran. Li Brukselê dilxweşî û piştigiriya xelkên Belcîkî yên di kolanên derûdora avahiya komisyona yekîtiya Ewropayê de dimeşiyayan geleki bala min kişand. Dihatin destê xwe ji me re bilind dikirin, hinek bi me re diqiriyayan, yan jî nivîsên ku me belav dikirin bi baldarî dibirin, wêna

Rênâme

Vekişandina serbazên Emrîkî ji Îraqê biyareke şaş bû li gorî hin rayedarên Emrîka ,helbet piştî hilbijartinê dawî û serkeftina Obama û tevger û çalakiyên rêxistina "Da'îş" û hevalbendên wê yên tîrorîst di Rojhilata navîn de bi taybet li Sûrî û Îraqê, xurîst e ku "Da'îş" û hemî tevgerên Islami yên tîrorîst nînaz û metirsiyê li ser berjewendiyên Emrîka pêk tînin ,ev jî dibe babetek ku sêd jê were girtin û hinek berjewendiyên kurdan pêk werin nemaze ku Kurd di xêza yekem de ne ji van fort û gefan, di gel zanîne de hate çespondan ku gefin(tîror) êş û bêtara serdemê ye û rûberûbûna wê pêwîste bi hemî alavên

Elî Çil Axa

heyî, lewra îro tê xwestin ku hevgerî û hevpeymanên xurt dinav tevger û rêxistinên kurdî de pêk werin û damezirin da ku bigihêjine biyareke rêzanî (siyasî) bîngeh be ji yekîtiyeye resen û rasteqîn re di vê rewşa aloz û awarte de ku gelê Kurd tê re dibore, herweha danûstandinên li Dihokê çêdibin û pêk tînin ji guft û goyan û gengeşê di navbera hêlên Kurdistanê Sûriyê de bi serpereştiya serok Mes'ûd Barzanî rênaseke diyar e û encamêke normal e jî boîrî û guhartinê bûyeran, lê girîngtrîn xal ew e ku bi zûtirîn demê rêkêftinê balkêş bêne pêkanin da ku sedemêke sereke bes ji karanîne re li ser zemînê,

nemaze wa tayên seretayî xuya dibin bi taybet li Kobanê bi şandina alîkarî û çekên leşgerî ji hêzên şervanên Kurd re û li hevkarîna herdu hêlên Kurdî di xalên sereke de, tevî ku gaveke girîng e û pîroz e. Dive ew rêkêftin nemîne dîla çar diwaran û bi zûtirîn dem were pêkanin û bibe nimûneyek ji nêzikatiya helwestên herdu encûmanên kurdî û nameyêke xurt be ji hêzên hevpeymanî re jiber ku baweriyayî wan bi rêxistinên kurdî girêdayî ye bi heman nêrinê ve. Ez dibînim îro ro Emrîka; amade ye bo piştigiriya Kurdistanê bike û nixandina wê ji rikberiya Erebî re cuda ye ji nixandina wê ji tevgera Kurdî re bi taybet di Sûriyê de û bi vî durvî Kurdên Kurdistanê Sûriyê sêdêkêrî yekemî di vê dozê de ne.



Dr.Silêman Elyas Li Ser Şunwarên Herêma Cizîrê Diaxive

Hevpeyvîn : Ehmed Bavê Alan

- Rojava ne Otêl e, dema xweşî be hûn lê rakevin û di astengiyê de hûn jê birevin.
- Dora 700 girî heye hîn me destê xwe nedaye wan,350 ji wan belgekîrî ne.
- Li Waşûkanî pirtûkxaneyek veşartî heye, eger were derxistin wê dîroka gerdûnê tevî biguhere.
- Wezîrê şunwaran yê hikûmeta Suriyê 11 hezar perçe bi balefiran birin Şamê.
- Desteya şunwaran ya " Kantona Cizîrê " Bi karê xwe radibe û bîjî ji wan re.
- Rewşa me ya siyasî gelek xirab û qelis e, partiyan me hîn negihane asta daxwazên me.

Di serî de em dixwazin hun xwe ji xwendevanên rojnemaya Bûyerpress re bidinznasîn?

Ez Silêman Elyas im, serokê rêveberiya şunwarên Qamişlo û Dêrikê me û mamost me di Zanogoya "Alfurat" beşê şunwaran de me, serokê şanda niştîmanî ya "Tilşîrê" ji bo xepartinê me. Ji 2006 an ve, şanda min dest bi karê xwe kir lê piştî kirîza Suriyê niha kar hatîye rawestandin.

Min li Rûsiyayê xwendiyê, bawernameya min dektora de zaniyariya şunwaran de ye şaristaniya hezarê şeşan li Bakurê Mezobotamiya (بلاد الرافدين), min 12 salan li Tilixzine xepartin (تنقيب) kiriyê, heta êdî min şanda xwe ya taybet bo Girê Tilşîrê ava kir..

- Ji xwendevanê me re li ser şunwarên Herêma Cizîrê biaxive?

Herêma Cizîrê dikeve Bakurê Mezobotamiya, di Çihanê de cihê herî tîr û tîjî şunwara ye, zaniyaren şunwaran dibêjin: "Kesên ku bixwazin fêrî Şunwaran bibin divê herin li Mezobotamiya kar bikin". Biqasî ku şunwar li Mezobotamiya hene li tu cihan tune ne, hemû gir in, helbet cihê ku gir lê hebin ew cih hatibin Ci-hgirtin (استيطان) pişt re jê bar kirine, û carekê din ji bichibûne. Ew gir du car û sê car hatine bichîkirin, mînak Tilşîr şeş caran hatîye bichîkirin, ew jî hezar sal li ser her carekê ku bichibû ye bûriye, û her carekê jê bar kirine, niha baş xepartin me li girê Tilşîrê kiriyê.

Niha ku tu her li ser lotika girên li Cizîrê bisekin tu dikarî deh gundan bihmêrî, ev tê wateya ku Herêma Cizîrê ji hezarê şeşan û heftan ve berî zayîne jiyân lê bûye. "Betrik Fayel" di slala 1983an de, pirtûka xwe çap kir û tê de dibêje: "Şunwarên li Herêma Cizîrê û li gor xepartin û lêkolînê di hezarê şeşan de (36) gund ji Tilbirakê heta Demir Qapo nêzî sinorê Tirkiyê hebûn di hezarê çaran de (62) gund bûn, di hezarê sisyan de hejmara gundan gîha (120) gundî". Herêma Cizîrê di dîrokê de lêkolîner jê re dibêjin "Landika şaristaniyê" Jiber hemû mercên jiyânê lê peyda dibûn. Û di dawîya hezarê sisyan de wêk jê re tê gotin "Memalik Almuadin" li vê herêma Cizîrê hatin avakirin

- Şunwarên li Herêma Cizîrê yên li ber çav çî hene?

Yên ber çav gir hene, ez ê wan ji te re bêjim: Şubat Inlîl (Til Lîlan): paytexta dewleta Aşûrî bû, qiralê wê "Şeşmî aded" qiralê Aşûran bû, berî navê "Şubat Inlîl", bi 50 salî navê wê "Şexna" bû, paytexta qiral "Apûn" ew jî Aşûr bû, bixwe li girê "Lîlan" jiyân dikirin.

Orkêş: Memlekeka Horiyan bû, gelekî Kevin e, niha şanda Amrîkî tê de kar dike li vir û di girê "Lîlan" de jî.

Horî memlekeke gelekî Kevin e, ta niha em nizanin ku ew kî ne ji çî nijadê ne, gelo Samî ne, Hîndo Ewropî ne? Hîn Lêkofîlî li ser vê mijarê berdewam in, eger em bêjin nijadê me kurdan "Horî" ne pêwîst e zimanê me Hîndo Ewropî bû, lê Mitani hatin vê derê û memlekeke di nav ya Horiyan de ava kirin, serkirdayên memleke Mitaniyan Hîndo Ewropî bûn, lê welatîyan ku tê de jiyân dikirin Horî bûn, şervanên Mitani dewletê ava kirin, bê guman çî girê di Herêma Cizîrê de Mitani tê de qiral û serkirdê bûn.

Taiyud (Til Berî), Naqar (Til Bîrak)

Hemoker: Ew jî girekî gelekî Kevin e, vedigere hezarê çaran berî zayîne.

Mihemed Diyab: Ew jî cihêkî gelekî xweş e û jî aliya şanda Ferensî û Sivêrsî aliya xepartin.

Til Erbid: Ew jî Mitani tê de gelekî pêşketî bûn, ji aliya Zanogoya Warso û şanda Amrîkî tê xepartin.

Çaxir Bazar: Ji hezarê şeşan ve heta Aşûriyan û Mitaniyan, û herwiha Misilman jî, jiyân lê berdewam e, niha şanda Tişikî û Belcîkî lê xepartinê dikin.

Til Şîr: girê ku ez xepartinê lê dikim" Şandina Niştîmanî ya Sûr"

Ev girên ku min behsa wan kir di dîrokê de gelekî balkêş in.

Berî çiqasî Kurd li vê herêmê dijîyan?

Em nikarin vê yekê bêjin û tekez bikin, ji ber heta 100 salî ew der çol bûn vale bû, Ewropiyên ku hatin vê derê û lêkolîn çêkirin dibêjin ku ew der vale bû, Kurd û Ereb tê de keçe bûn, cihê çûn û hatina Kurdan ne karê şunwara ye, lê ku tu bêjî li ser hebûna Kurdan li vir, Kurd jî zû ve li vir dijîn, bapîrên me li vir bûn Midî û Mitani, herwiha dîroka me Kurdan gelekî xort e û balkêş e, navê "Kurd" berî

zêdeyî 2000 sal hatîye vê derê, Kurd di herêma xwe de ne û jê derneketine û tu kes nikare vê yekê piştrast neke, nêrînek dîrokî dibêje ku di hezarê sisyan berî zayîne dema ku koçberî li Qefqazê çêbû, Kurdên Horî û Mitani bi wan re hatin vê derê, lê ez qet qebûl nakim dema ku hinek dibêjin ka em Kurd jî kû hatîne?! Ji ber ku em li çihê xwe ne û jê derneketine, loma em îro 40 milyon mirov in û ev yek gotîna min tekez dike, tu belge ji me re navin ta ku em vê yekê piştrast bikin, em jî aliya dîmoxrafî li ser xaka xwe ne.

- Heta niha we çend cih xepartinê?

Ez berpîrsê 6 şandên xepartinê me yên di herêmên Kurdî de xepartinê dikin, wek tîma min a xepartinê me Girê Til Şîrê xepart, ew jî ji sala 2006 an ve bû, Girê Til Şîrê girekî gelek kevnar e, ji 5000 ta 5700 salî berî zayîne jiyân lê berdewam e. Min di dema xwendina xwe ya dektora de bi mamosteyê xwe re di girê Xezna de kar û xepartin kiriyê bi şanda Rûsî re, li wir nimêgehek pîr mezin heye, û ew dever li ser sê şaxên Xabûrê ye.

- Girê herî giring ku şunwarên herî balkêş tê de hene, hûn nikarin bigihînin wan yan jî nehatine xepartin?

Ez dibêjim ku girên mezin û balkêş di vê herêmê de hatine xepartin, wek "Orkêş, Lîlan, Çaxirbazar, Tilbeyder, Tilşîr" ev in cihê ku gelekî giring û balkêş in. Û hîn gir hene nehatine xepartin, dora 700 girî heye hîn me destê xwe nedaye wan,350 ji wan belgekîrî ne, û yên din hîn em hewl didin ku cihê wan nas bikin, û bîn belgekîrin.



- Tu çawe bo Kongirê Îtalya hatî vexwendin, û we çî ji wan re got?

Belê ez hatim vexwendin bo kongirê zaniyare şunwaran yê ku di bin navê (Dostanî di navbera gelan de) û (Narvinê tu carî mirov di wêran û şeran de tenê nehêla ye) Û guhdana mezin di wî kongirê de li ser şunwarên Sûrî bû bi navê: (Hebûna şunwarên Suriyê di qonaxa şerê çar salan de) Û

ez wêk pîsporê şunwaran û serokê rêveberiya şunwaran li Qamişlo û Dîrêkê beşdar bûm.

Min di gotina xwe de got: " Ez we agahdar dikim gelfî pîspor û zaniyaren şunwaran, ku hemû şunwarên Herêma Cizîrê parastî ne ji%10 zirar negihya ew şunwarên me, lê deverê ku ji %10 zirar gihayê ew der di bin destê çete û terorîsan de ne" Dîsan dibêjin jiber ku em kurd herêma xwe diparêzin, û kurd nixê şunwaran dizanin, kurd dizanin ku ew der landika şaristaniyê ye. Û dixwazim ji xwendevan re vê bêjim ku zaniyarekî şunwaran pîr bi nav û deng e, navê wî "Matiyê" ew dibêje: "Her mirovek li gerdûnê du welatên wî hene, yek welatê ku ew lê çêbû ye, û welatê dî mezo-botamiya ye."

- Vî kongirî çî da we?

Belê xwesteka min wek pîspor di şunwaran de da min, min jî wan xwest ku ew alkariya me di parastina şunwaran de bikin di bin siya (UN) de jibo ew der bibe cihê guhdanê jî (UN) û min diyar kir ku em kurd beravaniya herêma xwe dikin û li dijî "Da'îş" şer dikin û pê re em şunwar jî diparêzin. Û ew kongir matmayî ma dema min got ku bêtir jî 1500 cih heye ku hîn nehatine nasîkirin û xepartin. Komîta birêvebir gelek guhdan dan min û gotina min, jiber ku ez bi navê Şunwarên kurdan û Mezo-botamiya çûbûm, û soz dan ku ew ê li ser vê projeyê kar bikin û wê alkariya me bikin, û wê şandek jî (UN) bê vir jî bo em tîkiliyan bi hev re bikin, û Kongirê Îtalya Pirtûkek bi sê zimanên Kurdî, Ingilîzî, û Erebî li ser

Kurdan ve girêdayî di xepartinê xwe de dîtine? Belê me hîn jî yên Horî û Mitaniyan hatin dîtin, lê hîn ew nehatine şrovekirin, lê li "Waşûkanî" bi du zimanan Horî û Mitani bêtir ji 300 "Table" hatin dîtin, pirtûkxaneyek pîr mezin li wir heye, di bawerîya min de eger ew pirtûkxana hat derxistin wê riwê gerdûnê tevî biguhere, û wê jî nû ve dîrok bê nivîsandin, lê mixabin jiber vê rewşê kar hatîye rawestandin..!?

- Kî di karê we de alkariya we dike?

Xelkên ku li cem me kar dikin ew karmendên dewletê ne û mûçeyên xwe distînin û heta demke ne dîr kesî alkariya me nedikir, lê ez çûm cem rêveberiya xweser û min jî wan re got ez li vir im û çî kar tê xwestin ez amade me ji ber ku ew jî min tê xwestin. Min xwendiyê ji bo ez van şunwaran biparêzim û divê win rê jî min re vekin, wan jî min re got em ê alkariya te bikin û dema wan rêveberî çêkir tîkîlî bi min re kirin û me hevrêzik baş jî bo kar çêkir.

- Desteya şunwaran di Hikûmeta "Kantona Cizîrê" de bi karê xwe radibe?

Desteya şunwaran hîn jî wan re divê, lê ew bi karê xwe radibe û bîjî ji wan re, dema ku cihek zîrar lê dibe ez jî wan re dibêjim û bi rastî ew bi karê xwe radibin û ev yek cihê rehetîya min e.

- Hûn şunwaran dişînin kû derê piştî win wan dibînin?

Berî vî şerî, berî şoreşa Rojava me dişand mûz-xaneyê "Dêra zorê", niha em kar dikin wan bişînin Şamê jiber ku şunwarên herêma Cizîrê hîn li wir in, û wezîrê şunwaran yê hikûmeta Suriyê 11 hezar perçe bi balefiran birin Şamê, ew ên Dêra Zorê bûn ên me hîn me nebîrme ez berpîrsê wan im heta rola me bê em wan jî dibîn..

- Metirîk mezin li ser şunwarên ku nehatine xepartin heye?

Bi rastî em nikarin tiştekî bikin, lê tiştêk din heye em karin bikin bi riya hevêrziya di navbera min û rêveberiyê de, heger çî serî wêk ez dixwazim ta ku em wan cihan biparêzin û ez li vir mame ji bo vê yekê, ez di riya rojnemaya Bûyerpress re banga xwe dişînim ji rêveberiya xweser re ta ku em wan şunwarên ku hatine xepartin û yên ku nehatine xepartin ji bo pêşerojê biparêzin.

Herwiha ez tiştêk din dixwazim di riya we re bê çapkirin

û belavkirin ez ji berpîrsê asayîşan ewên ku li ser rêbandan dimînin û parastina me dikin dixwazim bibêjim ji kesê ku bi terekoran axê jî giran dibin wan bisekinin û jî wan bipirsin ka we ev ax jî kû anye? Û divê min yan rêveberiya xweser agahdar bikin ta ku em karibin şunwarên xwe û dîroka xwe biparêzin.

- Wek kesekî çavdêr, tu rewşa siyasî û ya rewşenbîrî, tu çawa van rewşan dinêrxînî?

Rewşa me ya siyasî gelek xirab û qelis e, partiyan me hîn negihane asta daxwazên me..! Hêja ye gotinê ku "Lîrex" berî 300 salî dibêje: "Wê Kurd bighin asteke bilind di nav gelên rojhilata navîn de ji ber ku ew guh didin zanîne û guh didin jinê, va îro destpêka vê yekê tê xuyakirin, ev qedera me ye, Selah Aldîn berî 800 salî li pêşya "Selbiyan" sekinî û Orşelîma Quds azad kir, va îro dîsa qedera me ye em li pêşya çeteyên "Da'îşê" bisekinin û carekê din em Rojhilata navîn azad bikin, lê siyasetmedarên me ne li gor xwestekên me ne, mixabin..!

Û wisa jî rewşenbîrên me, wek siyasetmedarên me ne ew jî rewşa wan xirab e, ew bi berjewendiyên xwe yê kesayatiyê ve girêdayî ne ji ber ku ew jî wê dibistanê derçûn, ew jî mixabin..!

- Hûn rewşa civaka Kurdî çawe dibînin gelo hîn civaka Kurdî saxlem e?

Dibînim ku rewşa civaka Kurdî hîn saxleme û ez vê yekê di semînare xwe de dibêjim ez bixwe li vir mame ji bo vê yekê ji bo civaka xwe, gelek tişt li rex me hene li rex tu gelan di civaka wan de tune ne, anku nemane.

- Banga te ji kesên ku em jî wan re dibêjin "Mejî" û koçber bûne, çî ye?

Ez ne bi koçberiyê re me nexasim koçberiya "Mejiyan" kesên akadîmî û pîspor, îro Rojava li wan digere çaxa ku ez mafê gelê xwe bixwazim pêwîste ku ez nêzî gelê xwe bim û bidim gelê xwe û jî wan kesê xwedî bawername û pîspor re dibêjim Rojava ne Otêla dema xweşî be hûn lê rakevin û di astengiyê de hûn jê birevin..!?

Dr.Silêman tu çima li Rojava ma yî?

Ji ber ku ez Kurdî Rojava me û divê her mirovek tiştêkî pêşkêşî mîletê xwe bike, ez nikarim rahêjim çekan lê ez karim wan cihên ku şervanên me rizgar kirine ez biparêzim ji ber ku ez xwe di ber vê yekê de dibînin berpîrsyar, divê her yek jî bo parastina xaka xwe, xwe bibîne berpîrsyar.

Dawiya Piyalê

Hekim Ehmed

- Vê yarkujê tîrek weşand
- Hinav û dil pê herîşand
- Agir bi ser de lê reşand
- Sed bir û bawer hilweşand
- Perdek nema wê nedirand
- Sofî ji kuncê zivirand
- Ji- ser û dil iman firand
- Wek Botanî ew jî xirand.

Sebrî Botanî (Ji pirtûka Stranên Mihemed Şêxo Danhev û amedekirin Beha Şêxo).

- Wîlo ji nişka ve û yekser Yarkujê cihê xwe digire wek peykereke pîroz û nerîna xwe ya (tîr) weke fermanekê davêje meydanê, berê tîrê ne li evîndarekî tenê bû lê wê tîr(weşand).
- Armanca tîrê hinav û bi taybetî navenda hinavê (dil) bû.
- Weke tîra ku li dil dikeve, agirê dil jî wêneyeke kevnare di helbestê de, lê afirandina helbestevan di çarçewa nû de diyar dibe, nexasim di lêkeran de, ango wêne (tîr, dil, agir) kevn in, lê bi lêkerên nû (tîr weşand, dil herîşand, agir reşand) wêne nû dibin.
- Piraniya evîna di helbestên Kurdî de bi prensîp in, bi soz, peyman û bawerî ne, lê ev hestên ku baweriyên diweşîne, evîneke gihîştîye asta dînbûn û bêhişîyê, ev (Şêxê Sen'anî) tîne bîra me.
- Perdek nema, tîrs û şerm û guneh hemû di vê evînê de neman, tiştêkî qedexê tune ye piştî dîtina Yarkujê.

- Wîlo ji nişka ve û yekser Yarkujê cihê xwe digire wek peykereke pîroz û nerîna xwe ya (tîr) weke fermanekê davêje meydanê, berê tîrê ne li evîndarekî tenê bû lê wê tîr(weşand).
- Armanca tîrê hinav û bi taybetî navenda hinavê (dil) bû.
- Weke tîra ku li dil dikeve, agirê dil jî wêneyeke kevnare di helbestê de, lê afirandina helbestevan di çarçewa nû de diyar dibe, nexasim di lêkeran de, ango wêne (tîr, dil, agir) kevn in, lê bi lêkerên nû (tîr weşand, dil herîşand, agir reşand) wêne nû dibin.
- Piraniya evîna di helbestên Kurdî de bi prensîp in, bi soz, peyman û bawerî ne, lê ev hestên ku baweriyên diweşîne, evîneke gihîştîye asta dînbûn û bêhişîyê, ev (Şêxê Sen'anî) tîne bîra me.
- Perdek nema, tîrs û şerm û guneh hemû di vê evînê de neman, tiştêkî qedexê tune ye piştî dîtina Yarkujê.

Bûyer

Diyarî her kesê ku deng ava dike
Di ragihandina kurdi de
"Rojnâme Radyo Tv".
Serkeftinê bêguman dixwazim

Nûjenî ye Qamişloke Neynika demê ye "Bûyer" jî nû ye Li ser masê ye Vê spêdê Bi kûpa qehwê re ye Şahiye vegrin Kevoke beji neciviyane Vedixun tevî refên ç ivikane "Alors On Danse" Werin bidin semayê Her dem heye shensê jiyane Li nik "Bûyer"ê dîsa dicivin Rengereng in perperik in Bi canê sivik jîne di noşin Xam xezîn jîne ferewan dikin Kedeke pîroz e Zimanê rewya ye zikmakî ye Resene kurdewarî ye Li nik rojnamê ne Gulîstana malê ye Guldana peşerojê ye Havîngeh e sirûdeke Dîmeneke xuristî ye Civan e vê spêdê Xoşhaliyeke aram e Keyşa jiyane heye Li ber mirinê jî be Jiyani ji peyve ye Ji goranê ye "Baillamos" Hunereke civan e Jiyani bi hozanê re dihûne



Anahîta Hemo

Dibûre "On Sort Pour Oublier" Derkevin bo jîbîrkirine Rojnamekê kurd e Bistîrên jiyane Da ku çûkan vegeerînin hêlinê Berî baran bibare Hêlinên nû ava bikin Bi tenê awaz Me bi deyaş dikin Rê bi ferewani vedibin "I Miss You" sirûda jiyane Hebûna gela ye Ji we hez dikim Evîn azadiya min e Hezkirina min e Ji jiyane binoşe dayê Li hêviya nevi û neviçirkan Zanîne di noşin Piyal bi piyal Xoşhalî ye Noşican e şîrê te Dayê Spêde baş Qamisloke Vê spêda bê kariyê Roja pîrozbahî ye

Qamişlo



Zahid Mehmûd

Xweliya reş dibare. Qamişlo ev çi taristan e? Kolan û sikakên te tengijîne. Berdêlên mirovahiye di şunwaran de Sergiran in, windan e. Keserên dirêj hildikişin dilê min. Ma dawiya bobelatê ne hat Qamişlo? Gava ez biçûk bûm. Min rihnikên c'edê te Ji dût ve silav dikirin. Min amadekariya dîtina te dikir. Û ji bihna nanê bazarên te Yê gerim pir hez dikir Qamişlo evîna berdewam. Ahişga giriyê dilsozan. Gerewa bazirganiya çetê cengan. Berxwedana mêr û keç û xortan. Navê te deng daye cihanê. Û bi yek dengî çelengên te Digotin neyarên te: De herin me hun navên! We xwîn mişt û mêjiyê me Li ser dergehê vîna xwe Ji hevsojiyê dişûst. Qamişlo ev çi tar û mar e? nefret bi wan keve Ew neyarê çavê te giriyandin. Bejna te veqetandin Tu radestî ramanqirêjan kirin. Guh nedan vîna te. Sirûdê wekhevîyê Mêvani zindanan kirin. Xwediyê te penaber kirin. Qamişlo tê bimîne ya me. Xaka te di dilê bîranînê me de Xwe diçikilîne. Ava te bihna dinyayê fireh dike. Seyranên li gasîn û beyarên te Rûkê dinyayê geş dike. Çirokên evîndaran hambêz dike.

Careke Din Helebçe!



Şehnaz Şêxê

Dema asiman lerizî Min nas kir stêrek nû Bi sînga xwe vekir *** Dema dirêkê rondikin reş barandin Min nas kir Kevokek bi xwîn Di nav destên wê de çû *** Dema Qamişlo çîrek da Min nas kir zarokek wê wenda bû...! *** Dema mirinê Piştî xwe da me û çû Min nas kir kesek pir buha Bi xwe re bir *** Dema min li nav pirsî Xerdel di nav pêçiyên min de Herikî Careke di... Helebçe! *** Dema spîndar dibêje: Ez digirim Qamişlo kulîlk hîn nebişkivî bû *** Qamişlo Çûk nû difirîya Qamişlo Mûmên Avdarê zêde bûn Qamişlo *** Mirin di guhê min de dibêje: Kê gotiye mirin kor e? *** Dema li bîra xwe tîne Amedê Serê kaniyê û Zêwa Qamişlo tev mij û doman bi bejnek bilind Digirî dibêje: Careke din Helebçe!

Xewnek Seqemî

Xewnek seqemî Di baweriyên de bû Di arîna hêviyan de bû Spîndarek bi agravê re dijî Wêrekan..... Bi hêrêzeke lawaz Di naveroka xewnê de Hêlinek ji awiran ava kiribûn Bi agravê.... Serê tîran.... Dişîştin Li bin sîwana dara diriyân Li benda nêçîreke sergêjekî Diman Lê..... Aso ewrîn giran...giran Diyar kirin Niyaz bi bînefeşkê Li dû wan dikulkulî Cerdevanan lotik dan Zam dan zixtê Dilsozan.... birîn pêçan Bi tîna biratiyê Di hembêza dayikê de Vehêşandin Agirgûr şandan..... Çek hildan.. Ronî û sewat bûn bîra Zanbor mane îs. Bayê kur mitêl e Balgeh kevir e Şevên reş..... tarî Awazêke strayî.... Bi hevîrtîrêşke zuha Xewn di hestên wan de Bû giroveke paldayî Ji arê pîroz



Gulal Kasani

Kedxwer di çavê xwe de Radikirin Civanîk û xweşmêr Di şevînê de bendewar in Di jêrzemîn û xeşimeyan de Hûçik vedmalandin Gulî dihûnan Pî û pêngava dihejmartin Dipîvan..... Merdan bi şeqepêlî Li taristaniyê...hovitiyê, li koletiyê Gef xwarin Hêvî û xwezî terr vebûn Mirov germîjî Piştrast ma Rastî bû bersiv Serast dibin çiv Xewna qerimî Şabaş û ohyan Li ser pêsîra dayikê Pakrawan nivist Man şadi û geş Çi xewneke xweş.....

Çete

Hey çete peyva çete vajî di rêka kor Susrete sihr û şete xêzek ji tîpên sor Lawir e hem gawir e bêmerwet û endaz Buxure zir û vir e pûçel dibe daxwaz Sihrebaz fêl û finas dût in ji ol û bext Bêrewaz mirhov û nas aware û mişext Hat mexel Lat û Hubel ke-be li vir danî Çav çepel nêrîn zexel afat bi xwer' anî Sêwelek hatin bi lek derbas kirin pir mal Çav belek , kezîyên xelek dan ber sim û mertal Rûreşî şerma geşî kurdo di nav wer bû Tewîşî , hêvî xweşî colik li vir bir bû Zivirî dewran gerî ev xak kirin l'ev par Gindirî mal û serî pêt û dûman û ar Rev revî dor û kevir arzan kirin namûs Tev hevî xewna şevî hêvî li wan kabûs




Melevan Resûl

Ka simax hey mêrê yax bejna diçû banî Celde û tax wêrane bax berdani bi hêsani Sîxuro tû kewgirî cotî digel dijmin Ser şîrî par û perrî gemş û qirêja min Hey xîzin bê fetl û biz navê we bû ternal Guhderiz dozê dibiz hilda li şûnê al Qehreman can û rewan rêgir li wa bû bend Niştîman agir vedan sînda bi xakê xwend Lewlebaz qurnaz û gaz bihna kubaba çûn Bê rewaz bê tîrs û raz sergo diçin bêşûn

Kobanê

Seydayê Dilbirîn

Hatiye nivîsandin li seranserî cihanê Di paxila Arîn de li atom û volqanê Li kolanê bi qirêna berxwedanê Li şerên xort û keçan li êrişê şêranê Li ser lêvên şehîda navê te Kurdistanê Li Mihabada Çarçira li Ameda berxwedanê Li kolozê Şêx Seid li agirê Doxanê Li berika Qorqemaz li gever û Botanê Li Enfal û Hehebça li Geliyê Zilanê Li Şingala birindar li



hewara viganê Li Hewlêr û Qamişlo li kelha serhildanê Li ser kêlên şehîdan navê te pakrawanê Li qelêşa rûkenê li bejna qomitanê Li çadirên koçberan li ser ba û baranê Li dergûşên zaroka li hêsrên dayikanê Li ser zendên fedekar li gulya Arînê Li devê mahozêrê li xincera Berzani Li diwarê zîzana li sêng Ocelan î Wa Kurdistan kat daye ji navê Bêrîtanê.

Kurd Ji Kuran Hez Dikin û Dê Dibistana Malê Ye. Ji rêzgirtina zêde ji jinê re.. gelek malbatên Kurdan bi navê jinan tên naskirin

Wekî her milletê di Kurdan de jî malbat bi zarokan tê holê. Helbet ji bo ku jin û mêr bibin malbat divê zarok hebîn. Ji demên berê vir de anîna zarokên pir li cem Kurdan wekî adetekê ye û tişteki girîng e jî. Hîna ku di ser zewacê re salek derbas nedibû, mezinên wan e'şîran an jî malbatan ji wan zarok dixwastin. Helbet bi gelemperî jî zarokên kur dixwastin. Lewra wê demê jiyana bi zehmetî li gund û çolan, derbas dibû. Sedemên wê pir in. Ji vana yek jî ew e; Karê erdê pir bû, bi gelemperî mêr li çol û zozanan dixebitîn, sedemêke din jî, ji bo ku e'şîr piçekî din jî xurt be, bi hêz be. Helbet malbat hebûn zarokên wan çenedibûn. Wê demê jî wê malbatê re digotin korocax. Jinêk heger di malbatekî de, hew qîz bianîna dinyayê jî dîsa digotin korocax. Bi gelemperî di malbatên wisa de mêr dîsa dizewicî. Heya ku zarokê wan çêdibû, an jî kurikek çêdibû mêr di-

karîbû bi dî sê jinan re bize-wicîya. Demên berê jiyana zehf zor bû. Di nav qebîlê û e'şîran de her tim pevçûn hebûn. E'şîrên xurt bi ser e'şîrên qels de digirt û tevî e'şîrê xwe dikir. Ji ber vê yekê dixwastin ku zarokên wan pir çêbibin. Em li dîrokê dinêrin ku malbateke Kurd, ji kêmî 10 zarokan nehatiye holê. Ji demên berê de Kurd xwedî zarok in. Di her malê de nêzikê 10 - 15 zarokan hene. Ji pêncan kêmîr şerm dihat qe-bûlkirin. Jin her sal dû-canîbûn. Ji xwe di navbeyna emrê zarokan de salek tenê he ye. Hemû temenê wan wek hevdu ne. Ev karên giran û zehmetî li ser millê jina ye. Helbet ev yek Xwedê Tela daye ser piştê jinan. Ev qebîlîyet di xuluqa-nîna jinan de heye. Lê di nav Kurdan de ev huner zêde hatiyê bikaranîn. Lewra jinan demên berê pir zehmetî kişandine. Derfetên wê demê û wê demê ne wekî hev bûne. Jin, Him ji aliye tenduristiye û zehmetî

kişandine him jî ji aliye pîsikolojîk ve. Lewra jin wekî makîneyêki nesekinîne. Her sal zarokek anîne. Di dawiyê emrê xwe de jî bi nexweşiyên re mijûl bûne. Pîsikolojiya wan xirab bûye. Li xwe bi çavekî din nêrine. Xwe bê qiymet dîtine. Lê belê mêr bi qetî tevgerên wisa li ber jinan nekirine. Mêr her tim hurmet dane pîrekan. Soza jinan jî di nav malê de derbas bûye. Heta carina jin pir bedew an jî bi aqil bûne, ji ber vê yekê paşnavê zarokan navê diya wan bûye. Yanî bi navê de hatine bangkirin û hatine naskirin. Mînak; Wekî Evdalê Zeynikê, Zivqarê Gulo û hwd. Gelo çihê zarokan di malbatê de çi bûye? Bi gelemperî zarok fêkiyê malbatê bûn. Ji aliye mezinan ve pir hatine hezkirin. Zarokên kur ji zarokên keç bilindtir hatine qebûlkirin. Heger sermiyana malbatê rê bida, idara mal û mülk diket destê zarokên law. Helbet carinan li ser keçan jî ev barê giran dihat

Jiyan Ebdo

danîn. Heger di malbatekê de zarokê law tunebûya an nexweş bûya îdare diket destê jinan. Carna jin jî dibûn serokê qabileyêkê. Fikrên zarokan di mal de bi qiymet bûn. Mezin bi zarokên xwe dişewirîn. Di malbatên mezin de bapîr an jî dapîr hebûn. Bi neviyên xwe re ew eleqedar bûne. Bingeha zarokan wan ava kirine. Ji ber wê dîsa jin bi zarokan re mijûl bûne û mezin kirine. Ev erkên jinan bûn. Bi kurtasî her tişt dîsa bi destê jinan bûye. Barê jinan giran bûye. Him li golan xebitîne, him zarok anîne him jî mêrê xwe re jîntî kirine. Carna jî bûne serokê hozê. Helbet di vê derê de lazim e mafê mêran jî em nexwin. Lewra heke wan jî pişgirî nedana jinan, di bin ew qas karan de jin wê bifetîsiyana. Yanî jiyana parvekirin e, bi parvekirinê jiyana xweş dibe û bêhempa dibe. Fêkiyê parvekirinê jî zarok in.....

Ta Ku Zarok Bê Lédan Bi Ya Te Bikin

Zarokên min bi ya min nakin. Van zarokan kezeba min reş kirine. Ez bi zarokên xwe re şewitim. Ev çen hevok tim li ser zimaê perwerdekan e, bi taybetî dayik, ew ên ku pirsî-yareyêke mezin li ser milê xwe radihêjin, ew ên mirovan çêdikin, lê orger-nasên perwerdeyê çend awa û şîret hene ku tu çawa bihêlî ku zarok wek tu bix-wazî bike bê ku tu awayên şaş wek lédanê û dengê bilind bikar bîni. Ew jî Ev in: 1- Şîretên biçûk û diyar bidin wan, pê re gotinên we heta asteke mezin xuya û zelal bin, da ku tu barê zarokê sivik bikî, lê eger ew nas neke tu çî dixwazî wê her tiştê pê giran bike. Wek mînak bêjin: (Ji kerema xwe re lîstikên xwe bide hev û bixe tûrê wan de) Nebêjin: (Çima tu carekê ji ba xwe ranajê lîstokên xwe) Bi rastî zarok bi vê dirame ku pîrseke bersiv jê re divê û ew nizane bersivê!!? 2- Dema tiştê baş kir wî bi gotinên xweş û tiştên jê hez

dike xelat bikin, weke ku win ji mezinan re bêjin, ji zarokan re jî bêjin: (spas, dest xweş, te kêfa min anî destê te sax bin li ser vî tiştê te kir) 3- jimartinê bikar bînin, jê bixwazin ku heta win bighin jimara pêncan, divê wî lîstokên xwe dabîn hev: (Yek..didu....) û eger weke we kir jê re çepikan bidin û bêjin: (Biravo, tu jêhati yî, te zû dane hev...). 4- Nû dest bi karê baş kir, navtêdanê û pisandinê bikar bînin da ku raneweste: (De kurê min, winê niha bibîni wê zû bike) 5- Dawîkirina karê baş bi tiştêki xweş ve, girê bidin(dema tu destên xwe bişo, em ê xwarinêke xweş bixwin, piştî tu pirtûkên xwe bidî hev, ez ê tilivizonê jî te re vêxim). Li destpêkê xwe rahînin ji bo danûstandinê bi zarokê re, li gor moral û mezacê xwe pê r neaxivin, lê li gor karê wî, xelat bikin, û carna siza bikin, bê tundî, ji ber ku nedana xelatan (tiştên xweş- tilivizon- Lîstok) bi xwe sizakirineke..

Çalakî

Yakîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê Çûn Ser Gora Cegerxwîn.



Di vaxwendineke vekirî de Yekîtiya Nivîskarên Kurd- Sûriya, li gel gelek rewşên bîr û kesayetiyan naskirî serdana gora Seydayê Cegerxwîn bo boneya sî salî li ser koçbarkirina wî kirin. Di destpêkê de xuleyêke bêdeng li ser gîyanê Seydayê Cegerxwîn sekinîn, pişt re Xalê Ehmed yê ku hemû helbestên Seydayê Cegerxwîn ezber kirbûn çend ji wan helbestan xwendin, û êdî gotina Yekîtiya Nivîskarên ji hêla serokê Y.N.K.S ve Dilawerê Zengî hat xwendin, Seydayê Dilbirîn , û Rêxistina jinên azad jî gotin û helbestên xwe xwendin.

Cegerxwîn Li Heskê



Di 22.10.2014 de li Navenda Cegerxwîn ya Partiya Demuqrata Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê, Şevbuhêrêk helbestî bo boneya Sî sla ku li ser koçkirina Seydayê Cegerxwîn buhurî-ye lidar ket, bi amedebûna nivîskar û rewşên bîrên bajarê Heskê şevbuhêrêk destpê kir, tê de helbestvan Salihê Heydo û bavê Serbest, û helbestvanê ciwan Azad Osê gelek ji helbestan xwendin, piraniya wan li ser yekîtiya kurdan û piştgiyariya Kobanî bû..

Partiya Çep Salihê Silo" Bavê Mislih" Ji Bo Salvegera Cegerxwîn Xelat Dike



Bi boneya derbasbûna sî salî li ser koçkirina Seydayê Cegerxwîn navenda Celadet Bedirxan Ya partiya Çep a Demuqrata Kurd li Sûriyê ev roj bibir anî û semîna rek jî bo wê rojê lidar xist, bi amedebûna gelek nivîskar û rewşên bîr û hezikirîyê Seydayê Cegerxwîn mamoste Winda Şêxo bi xuleyêke bê deng li ser gîyanê Cegerxwîn dest bi semînerê kir, nivîskarên ku semînar birêve dibîrin mamoste Dervêşê Xalib, Konê Reş, û Deham Hesen bûn. di dawiyê de Salihê Silo "Bavê Mislih" yê ku (8) Dîwanê Seydayê Cegerxwîn ezber kirine, ji hêla mamoste Salihê Gedo Sekretêrê P.Ç.D.K.S ve hat xelatkirin.

Partiya Guhertin Siyasetmedar û Rewşên Bîran Li Dor Maseyek Gotûbêjiyê Dicivîne.



Piştî ku kongirê xwe lidar xistin, Partiya Guhertina Dîmuqrata Kurdistan, birek ji Siyasetmedar û Rewşên Bîran li dor maseyek gotûbêjiyê civand. Tê hindek xalên girîng hatin gengeşekirin mîna Rêkeftina Dihokê û bandora wê li ser xelkên Rojavayê Kurdistanê eger biser ket, tekezkirina ku (PYD) partiya herî serke ye ku kar di Rojavayê Kurdistanê de dike, herweha li ser masê silav û piştgiyariya "YPG" jî hat kirin.

Li Ser Koçkirina Serokê Partiya Yakîti (Alwehdê)Isma'îl Omer Di Salvegera Çeremîn De Bibîr Tê.



Bi vaxwendinekê jî komîta Dîwana Waşûkanî " Dirbêsi - Serê Kaniyê" Şandên rêxistina Partiya Yekîtiya Demuqrataî kurdî Li Sûriya(Alwîhdê) li Cizîrê : Serê Kaniyê, Dirbêsi,Tiltemir, Amûdê, Heskê, Qamişlo, Tirbesipiyê, Girkêlegê, û Dêrik, serdana gundê "Qireqewê" ji bo salvegera çeremîna ji koçkirina Sekretêrê Partiya Alwîhdê Isma'îl Omer zindî bikin. Piştî xwendina fatihê, Hesen Biro bixêr hatina hemû şanda kir, û paşê Gotina partiye jî hêla Xebat Mihemed ve hat xwendin û tê de spasîya hemû şandan bo wefadariya wan ji serokê Partiya wan re Isma'îl Omer kir.

Zarok Dirûşma Gerdenazî û Xuncên Paşerojê Ne



Di bin silogana (Zarok Dirûşma Gerdenazî û Xuncên Paşerojê Ne) Yekîtiya Jinên Kurd yên Azad li Qamişlo ahengê jî bo zarokan lidar xist, bi mêvandarîya Koma Xelat (Beşê Zarokan) ahengê destpê kir, gelek Stran, şano, dilan ji wan re pêşkêş kirin, êdî zarokan jî ji bo Kobanî û şengalê stran gotin, di dawî de komîteya berpîrs xelat diyarî zarokan kirin..



Dahatên albûmê ji bo penaberên Kobanî û Şingalê

Stranbêja kurd a bi nav û deng Dilniya Qeredaxî got ew dê dahatên albûma xwe ya nû ji penaberên Kobanî, Şingalê û pêşmerge re bibexşîne. Hunermenda kurd Dilniya Qeredaxî ragihand ku wê albûmek ji 10 stranên pêkhatî amade kiriye lê ji ber rewşa Kurdistanê ya niha wê hêj ne daye bazarê. Qeredaxî herwiha got, "Taybetiyek ya vê albûme heye. Ji bo rewşa Kurdistan tê de ez ê dahatên albûme bibexşînim birayên me yê pêşmerge û penaberên Kobanî û Şingalê."


Xanimeke Kûrî bi filîm piştewaniya Kobanê dike



Xanima derhênera Kûrî (Dahcîma) bi rêya filîma xwe a bi navê (Sîber) beşdarî li kernevala nimayîşa filim li bajarê Silêmanî dike. Bi daxuyaniyek taybet de bo Xendanê, Dahcîma got: Ez kêfxweşim ku dikarim bi rêya sînema piştewanî li xelkekî bikim ku ji bo ax û niştimana xwe, xwe dikin qurbanî û li hemberî terorîstan westiyane û şer dikin. Dahcîma hêviya xwe jî

anî ziman ku bi rêya filîma xwe bikare piştewaniyê li Kobanê û penaberên wan navçane bike û daxwaz ji sînema-karên cihanê jî kir ku li hemberî ew tawanên li dijî mirovatiyê tene kirin bêdeng nemînin.

Festîvala filim bo piştewaniya Kobanê li bajarê Silêmaniyê û li hola rawêşên birî di roja 1/11/2014 rojên piştî wê birêve diçe.



Jiyan Di Vir Re Derbas Bû

Kurdî Xweş e

xwejêxistin	استغناء
Sêdare	سداقة
Qamçîbaz	جناد
Mukurhatin	اعتراف
Gunekarî	خطيئة
Hovîti	رحمة
Sê	نفس
Wêran	تدمير
Tevankarî	حرمية
Mistbazî	ملاكمة
Tiror	ارهاب
Sextabazî	تزوير
Riswakirin, hetikandin	الضاح

Mamik ???

Li kevir dixim naşkê, li avê dixim dişkê.
Marê mirî tîr kir î?
Ne li erd e, ne li ezman e, hêlîna begrewan e?
Odak şuştî, rêzek zilam lê rûniştî?
Kumê hûtîk tije nûtîk.?

Bersivên Hejmara (5)an
Kûsî- Hêk - Ziman - Kon - Pîvaz

Xwezî

*Xwezî dijîminê min himber ba, ne qeşmer ba
*Xwezî mirov çî bibihîsta di guhê xwe de bihişta
*Xwezî ez bûka xerîba ma , ji bo min tîr pesnê mala bavê xwe bida
*Xwezî mirov biçûkê sa ba, û ne biçûkê bira ba
*Xwezî yara min kildanek ji min bi xwesta, minê tiliyek xwe jêkîra, û çavekî xwe derxista
*Xwezî ez bi bûma mirê mirada, minê ji nûve mara jin û mîra li hev bada.
*Xwezî hakîmekî adil li welatê me raba, ji bo jina qenc bistenda ji xeraba
*Xwezîya min bi xwezîyê xwezî keçên bavan neçûna ser hewiyê .

Zûbêjî

Tu dikarî sê caran, zû li ser hev bêjî:
Sî sewal û sê şivan,
sê dewar û sî gavan

محطة محروقات ومغسلة
ميديا
GAZIYA MÏDIYA
Salih Giştî
قامشلي . الشارع العام . مقابل الجمارك
450076

XAÇERÊZ

ASOYÎ:

- 1- Girekî li Kobanê ye.
- 2- Dîrok (vajî).
- 3- Bajarekîbakur e.
- 4- Paşnavêesadekînavber amem û zînexiradîkir, Jibobersivdanê.
- 5- Jin, Kolanadirêj (vajî).
- 6- Di sloganên de pirtêgotin (vajî).
- 7- Tersikevin, Beyreq, Paşkîtekebiçûkirinê.
- 8- Navêmehekê ye.

STÛNÎ:

- 1- Cihêntîkeyan.
- 2- Daçek e (vajî), Jibobangê.
- 3- Tiştênşêrîn.
- 4- Tim (bêdengdêr), Regez.
- 5- Jiêlên Kurd e.
- 6- Peyam.
- 7- Jibobersivdanê.
- 8- BajarekîRojava.

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								
2								
3								
4								
5								
6								
7								
8								

Hejmara Bûrî

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	G	U	L	Î	S	T	A	N
2	U	T	Î		I		T	U
3	N		D	E	R	D	O	R
4	E	M			Y	A	N	E
5	Y	E	W	N	A	N		D
6		Ş		A	N		B	Î
7	A		Û	Ç		Z	Î	N
8	K	Î	M	E	E	Z		